

Ezmûna Nirxandina Hejmara ji bo Year 1

Agahdarî ji bo dê û bav û çavdêran



Ezmûna Nirxandina Hejmara ji bo Year 1 çî ye?

Ezmûna Nirxandina Hejmara ji bo Year 1 (Year 1 Number Screening Check) nirxandinek kurt e li seranserê wîlayetê tê sepandin û ji mamosteyan re nîşan dide ka zarokê we di têngiştina destpêkî ya hejmaran de çawa pêşve diçe. Ev ezmuûna nirxandina temaşe dike ka zaroka we çawa dikare hejmaran nas bike, rêz bike, bijmêre, berawird bike, û çawa li hember hev zêdekirin û kêmkirin bike.

Zarokê we bi mamosteyekî/ê re bicive û dê jê bê xwestin ku persiva nêzikî 30 pirsan bide. Ev ezmûn bi gelemperî di navbera 10-15 deqan de tê qedandin. Year 1 Number Screening Check bi baldarî hatiye çêkirin da ku ji bo zarokê webê strêş be. Heger zarokê we dijêribe an jê re zehmet be, mamoste dê ezmûnê rawestîne.

Armanca sereke ya Year 1 Number Screening Check ew e ku agahiyên pêwîst bide mamosteyê zarokê we, da ku bikaribin planên hînbûnê ji bo zarokê we çêbikin. Hemû zarokên Year 1 dê bi taybetî û bi yekyek ji hêla mamosteyekî ve werin nirxandin.

Ger pirsên we di derbarê Year 1 Number Screening Check bi dibistana xwe re têkevin têngiliyê.

Têngiştina hejmaran çî ye?

Têngiştina hejmaran tê wateya karibûna fêmkirin, veqetandin û bikaranîna hejmaran, da ku mirov bikaribe di jiyana rojane de beşdar bibe û dinyayê baş têngihêje. Hin zarok di vê babetê de zehmetiyê dibînin, ji ber vê yekê girîng e ku ev zarok zû bîn diyar kirin. Bi vî awayî, mamoste dikarin planên alîkariyê yên taybet çêbikin eger pêwîst be.

Çima têngiştina hejmaran girîng e?

Bingeha baş ya têngiştina hejmaran alîkar dike zarokê we ku di salên pêşve yên dibistana sereke û dibistana amadeyî de têngiştinên matematîkî yên zehfir hêsantir fêm bike.

Xizmeta wergêrên li ser telîfonê

Eger pêdiviya we bi alîkariya wergêran Hebe ji bo têngiliyê bi dibistanê re deynin, telîfonî 131 450 bikin û bêjin kîjan zimanî hun dixwazin û we bi dibistanê re girê bidin. Opêrator de wergêrekî li ser xatê peyda bike ji bo alîkariya we bike. Ev xizmet belaş e.